Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1135 | 17-Çile- 2024 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# Dayika Zîn û hunera wê ya resen



Dayika Zîn a li Elbistanê dijî bi her cure tiştên ku çêdike hestên xwe bi rengekî hunerî dide der. Ev hunera wê rastî eleqeyeke mezin tê û mala xwe veguherandiye muzeyekê

Bêşik çîrokeke her mirovî heye û her mirov jî bi qasî çîroka xwe ye. Dema ku behsa Kurdistanê tê kirin, çîrokên ku bi mirovan re têkildar in jî dibe sedema xemgînî û êşê. Hin kes vê êşê li ser rûyê xwe de vedişêrin, hinên din bi rengekî wekî afirandinên çand û hunerî didin der. Ev berhemên bêhempa ji xeynî qîrîna di canê wan mirovan de hêvî û hesreta ku diherike nav jiyanê û çavên wan wek çemekî tu wateya wan nîne. Dayika Zîn jî çemekî wisa diherike. Çavên wê hema hema sed bihar dîtine.

Dayika Zîn hestên xwe bi hunerî dide der. Bi hunera ku diafirîne gelek wateyên kûr û felsefîk lê bar dike. Niha jî li gundê Qaşanê yê Elbistana Gurgumê dijî. Ev gundekî çiyaye û wekî Çiyayê Elewiyan tê nasîn. Niha malên gundan sade û bêşiwan in û ji ber sadebûna xwe jî tên nasîn. Lê bi hunermendî û sebireke mezin, Dayika Zîn mala xwe veguherandiye muzexaneyekê. Di hewldaneke ku mirov dikare weke afirandina tiştekî ji tunebûnê bê binavkirin, wê her tiştê ku dikaribû li ser tabloyeke resimê bidîta anî cem hev. Carinan cil û bergên xwe jî parçe parçe kiriye û ji wan karekî nû afirandiye. Wê tam 75 sal bê rawestîn berhemên bêhempa afirandiye. Pêşniyaz û hewldanên hevjîn û yên derdora wê ku xwestibin wê ji vê huner û xebatê dûr bixin jî nekarîne bi ser bixin û dayika Zînê rawestîn in.

Tişta balkêş ew e ku hema hema di her berhemên wê de neynik hene. Neynik biçûk in lê pir kûr in. Di dema niha de her ku mirov biçûk dibin neynik jî mezin dibin. Dibe ku ji ber wê dayika Zîn ev rastî dizanibû ku neynikên biçûk bikar aniye.

**Ji bo dayikê weke evînê ye**

Dayika Zîn di temenê xwe de şahidî ji gelek qewimînên trajîk ên ku bi serê civaka kurd û elewî hatine re kirine. Yek ji trajediya bi serê kurdên elewî hatiye Komkujiya Gurgumê ye. Dayika Zîn di Komkujiya Gurgumê ya sala 1978'an de qetilkirina bavê xwe û gelek xizmên xwe jî dîtiye û ji wê rojê ve ye wek êşeke giran dikişîne. Me ew êş di berhemên wê de jî dît û şîroveyên kûr lê bar kir. Hevjînê dayika Zîn, Apê Keyfo bi salan hewl daye ku ew dev ji vî kar û hunerê yanî ev huner a ku ji bo dayika Zîn weke evînê ye berde, lê dema ku bi ser nakeve, vê carê bişkok, neynik, têl, behîv û keriyên behrê weke kespik berhev kiriye û ji dayika Zînê re aniye. Piştî demekê, wî ew xaniyê gund ê biçûk veguherandiye cihekî rengîn ku her kes jê hez bike.

Li aliyê din jî jin li gundan gelek karan dikin. Dayika Zînê karê xwe yê din îhmal nekiriye û şevên xwe ji bo vê hobîyê terxan kiriye. Belkî jî sedema ku wê karîbû bi tenduristiyeke baş di riya jiyana sedsalê de bimeşe ji ber şiyana wê ya hilberînê be.

Em ji dîrokê dizanin ku her tim jinan hebûna jiyanê estetîk kirine. Çavkaniya hunerê jin e. Dayikên me yên weke Zînê yên ku çand, huner û kevneşopiyan diparêzin, heta roja me ya îro tînin. Êş û birînên xwe û me bi dirûnan pêçan, eşq û hesreta xwe bi morîkan xemilandin. Hêviyên azadiyê di tevnên xwe de honandine û radestî me kirine. Ev mîrateya me ya hezar salan e, divê em jibîr nekin û bidin jiyîn.

# Germahiyên zêde dibe ku heta sala 2050'î bibe sedema ji pênc qat zêdetir mirinan!

Pisporên navneteweyî hişyarî dan ku heke tedbîrên baş li dijî guherîna avhewayê neyên girtin di deh salên pêş de li seranserê cîhanê ji ber germa zêde dibe ku hema hema pênc qat zêdetir mirov bimirin.

Di raporta ku kovara tipê ya The Lancetê de hat weşandin, hat destnîşankirin ku di senaryoya germbûnê ya gerdûnî de zêdebûna germahiyê ya bi 2°C'î, mirinên salane ya girêdayî germahiyê ne heta 2050'î bi rêjeya % 370'ê ango heta 4.7'an be.

Raporta ku bi sernavê "Hejmara Tenduristî û Guhertina Avhewayê" ye, balê dikişîne ser gefên tenduristiyê yên ji ber guherîna avhewayê, wekî germahiya zêde û ziwabûn, vegirtina nexweşiyan û zexta li ser pergalên tenduristiyê.

Di raporê de tê dîtin kuemîsyonên karbonê yên bi enerjiyê ve têkîldar in sala borî gihaşt asteke zêde û hikûmetên ku piştgirî didin sotemeniyên fosil, şîrket û banqe tên rexnekirin.

Li gor daneyên raporê ku li ber çavan raxistiye, di sala 2022'an de di seranserê cîhanê de mirov bi gelemperî 86 rojan rastî germahiyên kujer man.

Di navbera salên 1991-2000 û 2013-2022'an de rêjeya mirina kesên ji 65 salî mezintir ji sedemên germê ji sedî 85 zêde bû.

Li gorî raportê, dibe ku sala 2023'an di dîrokê de bibe yek ji salên herî germ. Ev jî bi xwe re metirsiyên wek zêdebûna ziwabûnê, zêdekirina hejmara kesên ku bi bêewlehiya xwarinê re rûbirû ne, û belavbûna nexweşiyên enfeksiyonê li deverên nû tîne.

Yek ji mijarên ku di raporê de hatiye destnîşan kirin ev e; hewcedariya ku di danûstandinên avhewayê de divê zêdetir li ser tenduristiyê were sekinandin.



Sekreterê Giştî yê Neteweyên Yekbûyî Antonio Guterres di bersiva xwe ya ji bo raporê de diyar kir ku tenduristî û jiyana bi milyaran mirovan li seranserê cîhanê di metirsiyê de ye û wiha got: "Mirovahî bi paşerojeke xerab re rûbirû ye."

Dann Mitchellê ku Serokê Talûkeya Avhewayê ya Zanîngeha Bristolê ya Îngilîstanê ye, bang li hikûmetan kir ku armancên avhewayê bi bandortir bi dest bixin û got: "Hişyariyên tenduristiyê yên der barê guherîna avhewa de hikûmet qanê nekiriye ku bi têra xwe kêm bikin."

Sudoku: Bersiv 46

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 9 | 6 | 4 | 7 | 3 | 2 | 1 | 5 | 8 |
| 8 | 3 | 5 | 1 | 4 | 6 | 2 | 9 | 7 |
| 2 | 7 | 1 | 8 | 9 | 5 | 4 | 3 | 6 |
| 1 | 2 | 3 | 6 | 5 | 7 | 8 | 4 | 9 |
| 6 | 5 | 8 | 4 | 2 | 9 | 7 | 1 | 3 |
| 4 | 9 | 7 | 3 | 8 | 1 | 6 | 2 | 5 |
| 5 | 1 | 6 | 9 | 7 | 4 | 3 | 8 | 2 |
| 3 | 4 | 9 | 2 | 6 | 8 | 5 | 7 | 1 |
| 7 | 8 | 2 | 5 | 1 | 3 | 9 | 6 | 4 |

Sudoku:Pirs 47

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | 3 | 8 | | | 5 | |
| 8 | 2 | | | 9 | | | | |
| 3 | | 1 | 5 | | | 7 | | |
| | 4 | | | | 5 | 2 | 1 | |
| | | 8 | | | | 5 | | |
| | 1 | 7 | 2 | | | | 6 | |
| | | 9 | | | 6 | 3 | | 5 |
| | | | | 1 | | | 8 | 4 |
| | 6 | | | 5 | 8 | | | |

# FERHENGA BIWÊJAN

**Rast û çepê wî ne diyar in:**
- Bawerî pê nayê; kengê çi bike ne diyar e.

**Rûvî kirin şahê mirîşkan, got; kenê min tê aqilê min nabire:**
- Dema pêşniyareke baş ji yekî re tê kirin lê bawer nake, hingê tê gotin.

**Serê xwe lê hejand:**
- Ango baweriya min li te nayê; derewan dike.

**Siha spîndarê ye:**
- Bawerî pê nayê; kengê çi bike ne diyar e; mirov nikare li ber bayê wî biçe. (7)

**Şahidê rûvî dûvê rûvî ye:**
- Dema yek tiştekî dibêje û hevalê wî gotina wî erê dike, yê li hemberî wî hingê dibêje.

**Şam dûr e ma mişar jî dûr e:**
- Eger tu rast dibêjî, xwe li vir biceribîne.
(Li civatekê yek dibêje; li Şamê min xwe di ser heft mişaran re diqevast; jê re dibêjin; Şam dûr e ma mişar jî dûr e) ?

**Şopa wî ne paqij e:**
- Bawerî pê nayê; kengê çi bike, çi bêje ne diyar e.

**Te got û min bawer kir:**
-Tu derewan dikî; ne li bendê be ku ez ji te bawer bikim; wisa ne bêaqil im ku ji te bawer bikim.

**Teyrê nêçîrê serê nikulê wî xwar e:**
- Tu ne yê wî karî yî; kesê ji karekî fêm bike ji rewşa wî diyar e; ez bawer nakim tu bikarî wî karî bikî.

**Ti kesî nedîtiye spî bûyî seyê reş, ji qîvar û kerbeşê nayê bêhna gula geş:**
- Cewherê wî xirabe ye; ne li benda wî û qenciyê be.

**Tiştek xwe di devê wî de nagire; bi xwe nikare:**
-Nizane tiştan veşêre; ne yê baweriyê ye.

**Tobeya wî tobeya darkutikê ye:**
- Bawerî bi soza wî nayê; gelek caran heman soz daye û soza xwe pêk neaniye.
(Darkutik heta dibe êvar daran kun dike. Ji ber ku nikulê wî diêşe êvarê tobe dike ku daran kun neke, lê dema dibe sibeh dîsa dest bi karê xwe dike)

**Tu bi wê qûnê nagihî Meyqûnê:**
- Tu bi wê rewşa xwe nikarî wî karî bikî; tu ne yê wî karî yî; tu bi wî awayî bi ser nakevî.

**Tu bi vê qûnê nagihî ti derî:**
- Bi heman wateyê.

**Tu were ji vî qafî re bêje:**
- Tu nikarî bi min bidî bawerkirin; ez ji te bawer nakim; tu ne rast dibêjî.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Bêrîvan dilsoza welat û gelê xwe bû




Şehîd Bêrîvan di êrişên dagiekriya tirk ya faşîst û qirker a ku di 25`ê Berfenbara 2023`an de ku li ser çapxaneya Sîmav pêk hat şehîd ket. Malbata Bêrîvan girêdayî kesayet û jiyana wê diyar kirin ku Bêrîvan bi heskirin û xwestek tevdigeriya û dilsoza welat û gelê xwe bû.**R-2**

## Bi hevgirtin û vîna gelan wê êriş têk biçin



Li dijî êrişên dewleta Tirk a dagirker ên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriye. Gelê herêmê bi hemû pêkhateyên xwe her tim li ser piyaye û wê ji bona parastina ax û destkeftiyên xwe her li ser piy be û wê tucarî serî li hemberî êriş û gefên dagirkeriyê serî netewîne.**R-4**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1135 | 17-Çile- 2024 | www.ronahi.net/ku/

## Xebatên 2023'an wê bibe bingehê saleke nû û serkeftî



Cîgera Hevserokatiya Desteya Rêveberiya Herêmî ya Cizîrê Bêrîvan Omer diyar kir ku wan civîna xwe ya salê bi gelek encamnameyan bi dawî kirin. Biryareke sereke ji wan biryara jî ew bû ku bi awayekî aktîf beşdarî tevahî çakakiyên ji bo pêkanîna azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan bin.**R-6**

# LI HEMBERÎ ÊRIŞÊN QIRKIRINÊ BERXWEDANA GEL BERDEWAME

Bi armnaca qirkirina gelên herêmê û têkbirina vîna azadiyê, dewleta Tirk a qirker û faşîst êrişên xwe yên li dijî gelên bakur û rojhilatê Sûriyê didomîne. Di şeva 12 Çileya 2024'an de, dagirkeriyê careke din êrişî binesaziya herêma bakur û rojhilatê Sûriyê kir, di encamê de stasyonên petrol, gaz, av û cihên xizmetguzariyê hatin hedefgirtin. Herwiha bi 100'an gund, bajar û bajarok bê elktirîk û av man.
Li hemberî êrişên dagirkeriyê jî, gelên herêmê soza parastina destkeftiyên şoreşa 19'ê Tîrmehê nû kirin.**R-3**









## Mîtan 5 hevgirtina çanda gelan e



5'emîn Mîhrîcana Şanoyê ya Mîtan dengê hevgirtina çand û hunera azad li ser dika çand û hunerê li herêma Şehbayê raberî cîhanê dike. Ev cihwaziya ku hatiye raber kirin tekez kir ku Mîtan 5 dengê hevgirtina çanda gelan e.R-7

## 'Em hene û em ê hebin'

Hevseroka Komîteya Şehîd Berxwedan Samiya Xelîl, Endama Meclisa Malbatên Şehîdan Xêriya Hesen û Rêvebera PYD'ê Menîca Heyder kiryarên dewleta Tirk a dagirker li hemberî jinan şermezar kirin û gotin; Emê rê nedin tu kesî ku destdirêjiyê li ser jinê bike û em hene û em ê hebin.**R-5**



Hebûn; xweparastin e — Nehîr pale — R-2
Dê Kurd "Terorîstanê" ava bikin! — Zekî Bedran — R-5

Li Enqerê siyaseta tabûtan — Farûk Sakik — R-5

Rewşenbîr Û Civak .. Çend Têbînî — Kemal Necim — R-7

# Bêrîvan dilsoza welat û gelê xwe bû

Şehîd Bêrîvan di êrişên dagiekriya tirk ya faşîst û qirker a ku di 25`ê Berfenbara 2023`an de ku li ser çapxaneya Sîmav pêk hat şehîd ket. Malbata Bêrîvan girêdayî kesayet û jiyana wê diyar kirin ku Bêrîvan bi heskirin û xwestek tevdigeriya û dilsoza welat û gelê xwe bû.



Sebah Mihemed



Ciwan Mihemed



Zibêr Mihemed



Sertîp Cizîrî

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Dewleta Tirk a dagirker ji 23`ê Berfenbara 2023`an heta niha êrişî saziyên xizmetgûzarî yên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dike. Di van êrişan de heta niha 10 hemwelatî şehîd bûne û bi dehan jî birîndar bûn. Her wiha di saziyên hatine bombebarankirin de ziyanek mezin a madî pêk hatiye. Yek ji cihên ku bûye hedefa êrişên dagirkeran jî Çapxaneya Sîmav bû. Balafirên bê mirov ên dagirkeran di 25`ê Berfenbara 2023`an de Çapxaneya Sîmav a li bajarê Qamişloyê bombebaran kirin. Endamên çapxanê wekî her roj li ser karê xwe bûn. Di dema êrişê de 27 karmendên çapxaneyê, bêyî




ku haya wan ji tiştekê hebe serê sibehê saet di 08.00’an de dest bi karê xwe kirin. Dema wan karê xwe dimeşand, balafirên dewleta Tirk a dagirker derdora set 10:30`an çapxane bombebaran kir û komkujî pêk hat.

Yek ji karmendên ku di êrişê de şehîd ket jî keça bi navê Bêrîvan Zibêr Mihemed bû. Ku di sala 1990’î li bajarê Qamişlo hatiya dinyayê û ji malbatekî welatparêz bû.

Di êrişên artêşa Tirk a dagirker ên li ser bajarê Qamişlo de cihê herî zêde bûye hedef çapxaneya Sîmav bû. Di êrişê de 6 xebatkarên çapxaneyê şehîd bûn, gelek jî birîndar bûn. Piştî êrişan li holê avahiya hilweşiyayî, amûrên ji xizmetê derketîn, xwîna şehîdan û şerma mirovahiyê mabû. Di derbarê kurte jiyane şehîd Bêrîvan de malbata şehîd Bêrîvan rojnameya me re axivîn.

Di serî de dayika şehîd Bêrîvan Sebah Mihemed diyar kir ku Bêrîvan bi rihê xwe yê hevaltiyê û girêdana wê ji kar re gihîşta asta şehadetê û wiha got: “Piştî 10 sal ji zewaca me, xwedê Bêrîvan da me, ew keçka min a mezin bû û di nava keçan de min ew tenê hebû. Her wiha Bêrîvan ji dayika xwe re heval bû, her dem li kêleka min disekinî, keçeka pir zane û dilpak bû. Bêrîvan pir ji karê xwe hezdikir û girêdayê karê xwe bû. Her ku min digot Bêrîvan êdî bese ev 7 sal çêbû ku tu li çapxanê kardike li mal be kar neke. Ji ber ku 3 birayên wê hena û kar dikirin me ne dixwest ku Bêrîvan jî kar bike û ji ber çavê min biçe. Bêrîvan her dem digot ez ji karê xwe û hevalê xwe hezdikin û nikarin dûrî wan bikevim.”

**‘Pêwîste ku saziyên navnetewî li hemberî êrişan bi erkên xwe rabin’**

Sebah Mihemed di dawiya axaftina xwe de êrişên dewleta Tirk a dagirker şermezar kir û wiha got: “Siyaseta dijminahiya dewleta Tirk a dagirker a li ser xak û gelê Kurdistanê her ku diçe zêde dibe. Di 25`ê Berfenbara 2023`an de êriş hîn dijwartir bûn, bi balafirên bi mirov û yên bê mirov, binesaziya heremê kirin hedef û hemû cihên ku hatine hedefgirtin çavkaniya debara jiyana mirovan bû. Em van êrişên dewleta Tirk a dagirker yên li ser gelên herêmê şermezar dikin. Em bang li parêzvanên mafên mirovan dikin ku piştgiriyê bidin Rojavayê Kurdistanê, ji bo ku êrişên dewleta Tirk ên li ser gelên herêmê bên rawestandin û pêwîste ku cîhan tev zextê li dewleta Tirk bike.”

**‘Bêrîvan wê her tim di bîr û hişê gel de zindî bimîne‘**

Di heman mijarî de birayê şehîd Bêrîvan Ciwan Mihemed da zanîn ku Bêrîvan bû şehîda kurd û Kurdistanê û serê malbat û dostên xwe bilind kir û got: “Dema ku em sibehê ji xew şiyar bûn, min pirsa Bêrîvan kir, min gote dayika xwe Bêrîvan çima çuye kar, ji ber ku di wê rojê de gelek sazî û navend ji bona cejna sersalê di betlaneyê de bûn. Wê demê dilê min ne rehet bû bi çûyine Bêrîvan. Di dilê min de şewatek hebû. Lê min ne dizanî ku ew şewat şehadeta Bêrîvana min e. Dema ku dengê teqînê hat min texmîn ne kir ku çapxane hatiya hedef girtin. Ji ber ku çapxane cihekî sivîle, kar û xebatên wa çapkirina pirtûk û lênûsan bû, sîlahên wan pênûs bû. Dema ku agahî ji me re hat ku Bêrîvan şehîd ket; min nema karî bû xwe li ser çokan bigirin. Bêrîvan dayika mala bû, zanista mal û karê xwe bû, dilsoz û dilpak bû, hevala dil bû. Şehîd Bêrîvan gelek dihate hezkirin, dilê wê ji bo xebatê lêdixist û hertim hewl dida ku xwe di Kurdî de pêş bixe û ji civaka xwe nêz be. Her dem hewl dida ku pênûsa xwe bixe xizmeta civaka xwe. Şehîd Bêrîvan fedayiyê civaka xwe bû û ji bo me mînak bû. Şev û roj kar û xebat dimeşand. Şehîd Bêrîvan bi rihê hevaltiya xwe ya xurt dihat naskirin û her kesî jê hesdikir.”

**‘Bêrîvan dilsoza gelê xwe bû’**

Di heman çarçoveyê de bavê Bêrîvan Zibêr Mihemed da zanîn ku Bêrîvan keça kurd a pêşeng bû û wiha got: “Bêrîvan berî her tiştî mirovekî dilsozê jiyanê bû. Dema mirovek dilsozê jiyanê be, bê guman wê rêzê bide hemû rêgez û hêmanên jiyana xwe û ya derdora xwe jî. Ew dilsoza malbata xwe bû û ji bo ku barê malbatê sivik bike û bi malbatê re alîkar be, kar dikir û di kêleka wê de aşiqê karê xwe bû. Kar ji bo wê qadeke nû bû. Ji bo ku di karê xwe de serkeftîbe û bi karê xwe bibe pêşengê civaka xwe her tim di nava kar û xebatê de bû. Ji ber ku hin rêgez pêwîstbûn ji bona ku mirov di nava civaka xwe de bibe pêşeng, mîna dilsozî, xwestek, vîn û ked, ev taybetmendî jî li cem Bêrîvan peydadibûn. Lewma di demeke kurt de fêrî kar bû. Her wiha bû sozdara pêşengên qada jina azad. Her dem ew li cihê pêwîst bû. Bi heval û derdora xwe re jî dilsoz bû, ji wan fêr dibû û ew fêr dikirin. Bêrîvan serê me bilind kir û bû şehêda kurd û kurdistanê.”

**‘Bêrîvan jinek pir çalak bû’**

Di heman demê de Apê Bêrîvan Sertîp Cizîrî bibîr xist ku dagirkeran navendên gel ên jiyanî, xizmetguzarî û binezasiyê bombebaran kirine, di van êrîşan de gelek welatiyên Rojavayê Kurdistanê, Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê şehîd bûne û wiha domand: “Yek ji şehîdên bombebaranê jî Bêrîvan bû ku li çapxaneya Sîmav kar û xebat dida meşandin. Lê pêwîste ku em tev zanibin ku em kurd û gelên herêmê tev armanca êrişên dagirkeiya tirk a faşîst û qirkerin. Lê em wekê kurd emê li ber xwe bidin û em ê, jiyana azad avabikin û dawiya dagirkerî û qirkirinê bînin. Ger ku bêrîvanek şehîd bikeve wê bi hezaran bêrîvan werin dinya yê. Şehîd Bêrîvan jineke pir çalak û fedekar bû ticarê astengî û bend li pêşiya pêşketina xwe nedidîtin û roj bi roj di kar û jiyana xwe de serdiket. Di dawiyê de em bang li rêxistinên navneteweyî û herêmî dikin ku van êrîş û kiryarên dijmirovî yên ku dagirkeriya tirk li ser gel dide meşandin teşîr bikin û dewleta Tirk ji ber sûcên wê yên dijmirovî di dadgehên navnetewî de were dadgehkirin.

## Ji Pênûsa Jin

### Hebûn; xweparastin e

Nehîr Pale

Çeteyên dûrî exlaq, ji bo pere dixebitin û qanûnan nasnakin her tim weke hêzeke veşartî ji aliyê sîstemên dagirker yên mîna Tirkiyê, Îran, Amerîka, Rûsya û dewletên Ewrûpa ve têne bi kar anîn. Gel jî û bi taybet jin û ciwan dibin qurbanên polîtîkayên qirêj ên van sîsteman.

Li beramberî sîstemeke dagirker em tenê bibêjin ku zilmê li me dikin û em aştiyê dixwazin wê were wateya em têkoşîn nakin. Dîrokeke dirêj a têkoşîna jin heye, li hemberî sîstemên dagirker û cinsiyetparêziyê li ber xwe da ye û niha jî jin li hemû cîhanê têdikoşin. Jin li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê bi gelek şêwazan di nava xebatê de ye. Eger tu yek deqeyê li hemberî polîtka inkar û imhayê ya dewleta Tirk a dagirker tênekoşe, wê rehmetê li te neke.

Jinên siyasetmedar bi hiceta têkiliya wan bi Tevgera Azadiyê re heye û xizmeta wê dikin xistine zîndanan de. Sîstem di nava 24 saetan de mijûl dibe ku îradeya wan bişkîne û wan dûrî têkoşînê bike. Bi taybet li ser girtiyên siyasî yên nesaxiyên wan gelekî giranin şerekî taybet ê giran tê meşandin. Destûr nadin ku werin derman kirin, wan serbest jî bernadin û di aliyê manewî de rojane êrîşî wan û yên derdora wan dikin. Her wiha dayîkên temen mezin ku bi kopalan dimeşin rojane dikşînin lêpirsînê û wan ceza dikin. Aliyê civakî de jî pirsgirêkên exlaqî gihîştine asta ku ji bin kontrola civakê de derbikevin. Sîstem aliyê exlaqî û qanûnî ve destûr nade ku jin xwe biparêze, her tim jinê dixê rewşa ku bê parastin bimîne û rehet were qurtandin.

Li herêmên di bin dagirkeriya Tirkiyê de ne, jin weke xenîmeta şer tê dîtin. Saziyên Mafên Mirovan belge kirine ku çeteyên Tirkiyê bi hezaran jinên Efrînê revandine û heyanî niha çarenûsa 300 jinê ne diyare. Jinan bi darve dikin û hejmarek ji girtiyên jin cezayê giran xwarine. Jinên di girtîgehê de ne weke esîr nêzî wan dibin û her tim di bin navê disiplînê de wan ceza dikin. Çeteyên Tirkiyê bûne sedema qewmandina gelek buyeran. Çiqasî destdirêjî jin bikin, wê bikujin, birevînin û îradeya wê bişkînin ew qasî xizmeta Tirkiyê dikin. Ew çete şûna werin cezakirin têne xelat kirin. Kujerê siyasetmedara Kurd Hevrîn Xelef Ehmed El-Hayis ku bi navê Ebû Hatim Şeqra tê naskirin li zanîngeha Mêrdînê xwend û niha bûye berpirsyarê gurûpeke çeteyên Tirkiyê. Ebû Hatim Şeqra berpirsyarê zîndaneke Ehrar El-Şerqiyê bû, ew zîndan ji derveyî bajarê Helebê bû û di bin berpirsyartiya wî de bi sedan girtî hatine bi darve kirin, gelek jin û zarokên Êzidî revandine û gelek çeteyên DAIŞ`ê tevlî gurûpa xwe Ehrar El-Şerqiyê kirine. Ebû Hatim Şeqra niha xizmeta Tirkiyê dike û di bin ewlehiya wê de ye.

Sîstema ku polîtîka inkar û imhayê li ser gelan dide meşandin wê her tim armanca wê qirkirin be, ji sîstemeke wisa daxwaza aştiyê kirin wê were wateya teslîmiyetê. Jin ji bo hebûna xwe li hemberî van polîtîkayên qirêj biparêze divê her tim di nava têkoşînê de be. Hebûn xwe parastin e.



# Mîtan 5 hevgirtina çanda gelan e

Mîhrîcana Şanoyê ya Mîtan 5 dengê hevgirtina çand û hunera azad li ser dika çand û hunerê li herêma Şehbayê raberî cîhanê dike. Ev cihwaziya ku hatiye raber kirin tekez kir ku Mîtan 5 dengê hevgirtina çanda gelan e.

**Zana Roj/ Şehba**

Bi dirûşmeya ‘Em Diçînin Jiyan’ mîhrîcana Şano ya Mîtan gihîşt mewsima xwe ya 5 emîn. Mîhrîcana ku bi derfet û zehmetiyên koçberî û dorpêçê de li herêma Şehbayê hat li dar xistin, asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê derbas kir. Di roja 3 yemîn ji Mîhrîcanê koma şano ji bajarê Helebê bi şanoya xwe ya bi navê ‘Nêrîneke’ tevlî festîvalê bû. Her wiha di roja



5 emîn de giropa şano ku ji Başûrê Kurdistanê û ji bajarê Kerkûkê hatibûn, şanoya xwe ya bi navê ‘Ne Rewa’ beşdarî vestîvalê bûn. Festîval her roj bi coş, kelecan û beşdariya bi sedan ji gelê Efrîn û Şehbayê birêvediçe. Di festîvalê de mijarên cur be cur yên girêdayî civakê, jin, doza Kurdistanê, huner û gelek mijarên din di nava xwe de dihewîne. Her wiha beşek ji festîvalê bi leystokên ku diaxivin tê de cihê xwe digire. Bi gotin û qerfan pirsgirêk û mijarên civakî bi awayekî pêkenok tê pêşkêşkirin.

Têkildarî her du şanoyên Heleb û Kerkûkê. Derhêner Ebd El Rahman Omar yê giropa Helebê û derhêner yê bajarê Kerkûkê ji rojnameya me re axivîn.

**Ji Helebê şanoya ‘Nêrînek’**

Ebdulrihman Omer anî ziman Ku wan di festîvala Mîtan ya 4 emîn de jî cih girtin û wiha pê de çû: “Festîvala Mîtan ji bo gelê Efrînê xwedî wateyeke cudaye û li Şehbayê jî ev mîhrîcan îro tê berdewamkirin. Ev ne yekemîn car e ku em beşdarî vestîvalê dibin, di Mîtan 4 de em bi şanoyên xwe tevlî bûn. Niha jî cihê rêzdariyê û şanaziyê ye ku em careke din tevlî vestîvalek bi vê rengî bibin. Bi rastî Mîtan bi coş, hezkirin û heyecanek mezin berdewame. Em bi hêvî ne ku ev festîval bibe hêviya vegera ser xaka Efrînê”.



Ebdulrihman Omer

Ebd El Rahman bal kişand ser naveroka şanoya ‘Nêrînek’ û wiha got:”Şanoya ‘Nêrînek’ bi xwe li ser mijara fitnekariya ku di nava civakê de diaxive. Bi taybetî di dema rêjîma dewletê de ciqas ev yek li pêş bû û civak bi vê yekê fetisî bû. Her wiha ev yek heyanî niha berdewam e. Di heman demê de me xwest ji kesên derveyî Welêt re bidin xuya kirin ku ev diyarede heyanî niha tê jiyan kirin û civak hatiye helandin”.

Her wiha festîvala Mîtan bi beşdarbûna rengê Başûrê Kurdistanê hat xemilandin. Bi Şanoya ‘Ne Rewa’ ji Derhênertiya Berhem Ehmed û lîstikvan Nalî Esker hat pêşkêşkirin.



Berhem Ehmed

**Ji Başûrê Kurdistanê şanoya ‘Ne Rewa’**

Derhêner Berhem diyar kir ku di mijara xwe de bal kişandine ser girîngiya şanoya Kurdî û wiha got: “Di mijara me ya şanoyê de, bi taybet me bal kişand ser girîngiya şano û sînemaya kurdî di cîhanê de. Her wiha rola rewşenbîran di civakê de”.

Her wiha Berhem bal kişand ser girîngiya Mîhrîcana Mîtan û beşdarbûna wan jê re û wiha domand: “Em gelekî kêfxweşin ku em beşdarî Festîvala Mîtan bûne. Mîtan yek ji destkeftiyên herî girîng yê şanoya Kurdî ye. Gavên ku avêtine di van derfetên zehmet de cihê rêzdariyê ye. Mîtan her sal bi destgirtina mijar û zengînbûna şanoya Kurdî xwe îsbat dike. Mîtan ziman û çanda Kurdan û yên biyaniyan anî gel hev û kir rengeke ji zengînbûna şanogeriyê. Em bi hêvî ne ku Mîtan 6mîn li ser xaka Efrînê bê li dar xistin.”

# Wêjeya Şoreşê...(5)



**Elî Roj**

Tabloya şoreşê bi wêjeyê ji nû ve xwe bi reng û deng dike û mîna mirovê ku jinûve ji dayik dibe û dikare biaxive û çavên xwe li dunyayê bel bike, şoreş û wêje jî mîna av û masî bi hev ve girêdayî ne. Ango ji bo edebiyata şoreşê were vegotin, pêwîstî bi şoreşeke di warê wêjeyê de heye û ger ku ev şoreş pêk were wê bi xwe re gelek guhertin û veguhertinên bingehîn derxîne holê û dê şoreş bibe hest, ziman, awaz û wê xwe bighîne hemû deverên cîhanê. Di hemû şoreşên cîhanê de wêjeya şoreşê hatiye tomarkirin û wêjevanên ku rastiya şoreşê bi zimanê xwe vegotine û bi pênûsa xwe xêzkirine, rastiyên şoreşê gihandine roja me ya îro û ji mirovahiyê re kirine mal.

Ji dirêjiya dîrokê û bi riya dastan, serpêhatiyên devkî û nivîskî jiyan û hebûna mirovan nifiş bi nifiş hatiye heyanî roja me ya îro. Di serî de dastanên lehengiyê yên ku dema îro jî hîn mîna tabloyeke zindî di hiş û hizrê mirovan de ma ye, xwedî cihekî taybete di dîroka mirovahiyê de.

Dema ku mirov herikîna dîrokê û mirovahiyê dişopîne, mirov wê gavê wêje û wêjevanên ku bi riya destan, çîrok, helbest û awazan xweşikbûn û sadebûna cewherê mirov, xweza û cîhana hemû zindiyan bi rengekî têr û tijî danîne hole bi rengekî herî baş dibîne.

Di heman demê de û di destanên kevnar de mirov berxwedaniya gelan li hemberî sîstema serdest û êşên ku mirovan ji vê sîstemê kişandine bi zimanê helbest, çîrok, awaz û dîmenan dibîne. Ev hemû berhemên em behsa wan dikin, mîna şoreşekî bi hemû wateya xwe mirov dikare bilêvbike, ji ber ku ew rastiya tekoşîn û edebiyata şoreşa mirovahiyê li hemberî tarîtiyê bi me dide nasîn. Ango edebiyat xwedî kevneşopiyeke serhildêriyê ye û pêwîste ku mirov vê yekê bibîne û binirxîne. Her eserekî ku li ser kevirekî hatibe neqişandin îşaretê bi rewş û heyînekî destnîşan dike. Di vê xalê de nivîskarê navdar Dostoyvîskî wiha dibêje:“yek ji erkên wêjeyê şîretkirina mirovahiyê ye. Ji ber ku ew mîna pirtûkeke dibistanê ji bona jiyanê. Armanca xwe naskirina jiyanê û nirxên mirovî dide çandin.”

Wêjeya ku rastiya civakê venebêje û nebe ziman, deng û vîna civakê û di heman demê de çand, kelepûra civakê û hemû nirxên wê li hemberî hemû êrîşên dagirkeran neparêze, wê gavê mivo nikare jêre bibêje wêjeya şoreşê, an jî ya civakê.

Hemû pêşketin, şoreş û herikîna civakê û dîrokê bi riya wêjeyê dengvedana xwe daye cîhanê û mirovahiyê.

Şoreş bi vegotina wêjeyê dikare navnîşana civakê diyar bike. Li gorî vê yekê şoreş û rastiya şoreşê bi riya wêjeyê dibe xwedî wate û nasnameya xwe digre û nasnameya şoreşê jî bi wêjeya şoreşê pêk tê û mîna avzêmê diherike deryaya dîrokê.

Ji bo ku em di warê hişmendî, hizrîn û bîrdoziyê de wateya edebiyatê û cih û giringiya wê di nava civakê de nas bikin, pêwîst e ku di warê çandî û dîrokî de têgihiştineke me ya têr û tijî ji rastiya civakê û gel re hebe. Ger ku ev yek nebe, wêjeya ku tê kirin jî wê nebe malê şoreş û civakê û wê nikaribe guhetina pêwîst pêkbîne. Heya ku wêje bikaribe şoreşeke civakî pêk bîne, pêdivî bi nêzîkatiyeke rasteqîn ji dîrok, civak, xweza û gerdûnê re heye. Her wiha pêwîst e em di ferqa wê rastiyê de bin ku ne gengaze wêjeyeke ku ji rastî û nirxên civakî dûr û ne li ser kok xwe be û ji cewherê xwe dûr be, ronahiya serkeftinê bibîne û muhra xwe li dîroka mirovahiyê bixe.

Ji ber ku qada wêjeyê qada afirandin û şopandina jiyanê kêlî bi kêlî ye û mîna civaka xwezayî wêje jî bi rengekî xwezayî di hemû beşên jiyanê de xwe bilêvdike. Lê ji bona ku ev yek pêk were pêwîst e ku mîna volkanekî wêjeya ji nava hest, xeyal û hizrîna civakê mîna çem û robaran biherike, Herwiha ji bo ku ev ked û hewildan bighêje encameke berbiçav divê ku di nava komunalbûn û di xizmeta civakê de be. Di rastiyê de ya ku wêje û şoreşê digihîne hevdû, ked û afirînerî ye. Ev herdû jî hev temam dikin û pêşketina ku tê xwestin ava dikin û bi xwere civakeke zane û azad ava dikin. Weke çawa şoreş tenê çalakiyeke rûxandinê nîne, wêje jî tenê çalakiyeke nivîsê nîne, lewre herdû hîna zêdetir xwedî armanc û sinc in û çawe ku şoreş bi xwe re avakirineke nû û jiyaneke azad diafirîne. Di heman demê de wêje jî rastiya şoreşê ji hemû Milan ve radixîne ber çavan û van rastiyan yek bi yek zindî dihêle. Bi teybet jî dema ku kesên xebatên wêjeyê dikin şoreşger bin, wê gevê ew xwedî wê erkê ye ku wêjeya şoreşê bi rengekî herî baş binvîse û rastiyên ku hatine jiyankirin mîna şoreşgerekî vebêje û li ser bedena dîrokê xêz bike.

Heke ne wiha be, yên ku wêjevaniyê tenê ji ber wêjeyê bikin û ji rastiya gel û civaka xwe dûr vî karî bikin ew bi zanebûn an jî bê zanebûn destekê didin sîstema serdest û pilanên wê yên teşîrkirin, berevajîkirina çand û dîroka gelan.

## Têbînî



### Rewşenbîr Û Civak .. Çend Têbînî

Kemal Necim

Pirsek an jî gengeşeyeke ku di nava pir civakên cîhanê de berz bûye ew e, ka çima qutbûn û valehî di navbera rewşenbîran û civakê de rû daye. Ji xwe şêwe û egerên vê gengeşeyê li gorî her civakekê têne guhertin, her wiha dibe ku asta vê rûdanê li her civakekê ne weke ya din be. Lê bê guman eger di nava civakên din de ev pirs carekê tête arastekirin, di nava civaka Kurdan de du car û sê caran tê pirsîn û gotûbêjkirin. Ji ber ku Kurd niha di pêvajoya xweavakirinê û peydakirina nasnameya xwe li gorî zanist û ramanên mirovahiyê de ye.

Çand nirxeke bilind a mirovahiyê ye û berheva zanist, serpêhatî, perwerde, wêje û baweriyan e ku mirov pê bawer dike û awayên jiyana xwe, tevger û riftara xwe, cil û berg, xwarin û axaftina xwe li gorî wê bi pergal dike. Her wiha ew hêmana avakirin û pêşketina şaristaniyan e.

Rewşenbîr jî mirovekî bîrewer, ronakbîr, serbixwe ye, her dem ji bo pêşdebirina reftar, destkeftî û têkiliyên xwe dixebite, haya wî ji cureyên zanyarî û agahdariyan heye, bi her tiştê ku li dora wî diqewime re xwediyê têkilî ye û xwediyê roleke girîng e di avakirina civak, çand û şaristaniya civaka xwe û netewa xwe û mirovahiyê de.

Mijara têkiliya rewşenbîr û civakê jî ji berê de mijareke aloz e. Li gorî hin derdoran, erkê rewşebîran hilbirîna zanistên bilind, ramanên bilind û felsefeyên kûr û giran e û sazkirina şêwe û awa û zagonên rêvebirin û jiyana civakan e, lewma ne pêwîste ku civak hemû van hilbirînên ku zêdeyî bîreweriya wan e zanibe û hîn bibe. Lê beşek jî dibînin ku pêwîste rewşenbîr bi awayên afrêner karibe hilbirînên xwe yên ramyarî û zanistî û hunerî bighîne civakê da ku civak jî bi wan raman û hilbirînan bilind bibe û şaristaniya mirovahiyê berdewam bike û bilind bibe.

Ji bilî hilbirîna raman, huner, wêje û felsefeyê, erkdariya rewşenbîran heye ku van ramanên bilind û asê yên zêdeyê bîrweriya civakê, bi awayên afrêner û şêweyên cuda bighîne hemû beşên civakê. Di vê mijarê de yek ji awayên pir girîng û bi bandor sazûmana pewerdeyê û metod û alavên perwerdekirinê ye. Pêwîste hemû hilbirînên zanist û raman û wêjeyê bi awayên hêsan bibin pirtûk û metodên hîndekarî û perwerdekirinê, ji xwe kedkarên perwerdeyê bi xwe jî rewşenbîr in. Her wiha ji bo kêmkirina û piçûkirina valahiya di navbera rewşenbîran û civakê pêwîste yên rewşenbîr, afrêner, wêjevan û hunermend berhemên bi naverokên bilin lê bi awayên hêsan û bedew pêşkêkî civakê bikin. Pir nîvîskaran karîne bi rêya romanekê, yan çîokekê yan helbestekê ramanên felsefî yên giran û asê bi şêweyên hêsan bighînin civakê. Ango li şûna ku mirovek pirtûkeke felsefeyê ya giran bixwîne û têneghêje, dikarê wê ramanê yan felsefeyê bi romanekê ya berhemê din a wêjeyê hîn bibe û têbighêje. Mînakên wiha li cîhanê pir in, ku nivîskar û wêjevan û hunermendan ramanên felsefî û zanistên kûr bi rêya cureyên wêje û hunerê afriandine û bi hêsanî û bedewî arasteyê civakê kirine.

# Xebatên 2023’an wê bibe bingehê saleke nû û serkeftî

Cîgera Hevserokatiya Desteya Rêveberiya Herêmî ya Cizîrê Bêrîvan Omer diyar kir ku wan civîna xwe ya salê bi gelek encamnameyan bi dawî kirin. Biryareke sereke ji wan biryara jî ew bû ku bi awayekî aktîf beşdarî tevahî çakakiyên ji bo pêkanîna azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan bin.

**Avêsta Menaf/Qamişlo**

Desteya Rêveberiya Herêmî ya Kantona Cizîrê li hola Şito ya bajarê Hesekê bi beşdariya 200 deleqeyên ji meclis, rêveberî û desteyên herêmî yên kantona Cizîrê di 7`ê çileya 2024`an de civîna xwe ya salê li dar xistin. Her wiha di civînê de gelek biryar hatin girtin û erêkirin.

Di derbarê Civîna salana ya Desteya Rêveberiya Herêmî a Kantona Cizîrê, bernema û biryarên ku hatine girtin, cîgira hevserokatiya rêveberiya herêmî a herêma Cizîrê Bêrîvan Omer ji rojnameya me re axivî.

Bêrîvan Omer da zanîn ku civîna Desteya Rêveberiya Xwecihîn gelek xal û biryarên giring girtin û wiha got: “Civîna Desteya Rêveberiya Xwecihî di 7`ê Çileya 2024`an de li bajarê Hesekê hat li darxistin. Civîn her sal tê li darxistin, ji bo nirxandina kar û xwebatên salekê bû, bi tevlî bûne hemû şaredariyên li Kantona Cizîrê yên ku hejmara wan57`in civîn birêve çû. Civîn bi rewşa siyasî hat detpêkirin û li ser asta cihanî û bi taybet jî êrişên dewleta Tirk a dagirker li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê hat rewş û geşedanên heyî hatin nirxandin. Di civînê de raporên salana hatin xwendin, kar û xebat, pirojeyên ku hatin pêk anîn, pirojeyê ku ne hatin bêk anîn. Her wiha pirojeyê ku ji bo demên pêş hatina hazir kirin û zehmetiyên ku di sala 2023`an de derketin pêş, li ser wan nîqaş û nerxandin hatin kirin û ji bo raprên wan pêşinyar hatin kirin, de ku di sala 2024`an de bi awayekî xurtir û aktîf tevgerîn çêbibe û biryarên nû û girîng di vê derbarê de hatin girtin.”

### Zehmetiyên sala 2023`an

Berîvan di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: “Zehmetiyên ku di sala 2023`an de derketin pêşiye me, herî zêde êrişên dewleta Tirk a dagirker li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye, bi taybet di demên dawî de binesaziyên herêmê dike armanc. Ji ber vê yekê hin pirojeyên me hatin rawistandin, me giringî da cihê elektirîkê û avê da ku gel ji wan qut nebe. Armanca dewleta Tirk a Dagirker ewe ku bi riya armanckirina binesaziyên herêmê, gelê kurd koçber û qirbike, lê îradeya me mezintire ji êrişên dagirkeriya Tirk û faşîzma wê. Hewldana me ye sereke ewe ku av û elektirîkê ji gel re hîn zêdetir  peyda bikin û di vî warî de pêwîste tevdîrên me hebin. Ji ber êrişan me gelek zerer dît û vê yekê bandora xwe li ser tevahî kar û xebatê me kir û me di vî warî de gelek zehmetî kişandin, heyanî ku me careke din henek ji van saziyan careke din kirin xizmeta gel de. Di heman demê de em dikarin bêjin ku ji sedî 90 pirojeyên me hatin pêk anîn û pirojeyên me yê ku hatin rawistandin jî em hewildidin ku wan di dema pêş de temam bikin.”

### Bernama û biryarên ku hatin girtin

Bêrîvan Omer diyar kir ku di sala 2024`an de ewê bi hewldanekî mezin pirojeyên xwe pêk bînin û wiha got: “Piroje û Bernameyên me yên ku di civînê de hatin erêkirin û ragihandin ev in:

- Beşdariya aktîf di tevahî çalakiyên ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan.
- Ji bona pênasîna zagonên şaredariyan wê ji bona gel civîn werin lidarxistin.
- Bi hevkariya komînan wê xebat li ser pêkanîna hemleya ji her welatiyekî re darek bê çandin were kirin.
- Şaredarî di tevahî xebatên xwe de wê li gorî Hevpeymana Civakî tevbigere-
- Hejmara jinan di şaredariyan de were zêdekirin ku wekheviya zayendî pêk bê.
- Xebat li ser pêkanîna planên



şaredariyan ên 2024’an bê kirin.
- Ji bo Pirojeya Avê ya Amûdê heya Hesekê li ser were kar kirin.
- Li gorî Hevpeymana civakî ya nû xebat li ser pêkanîna pergalên nû yên şaredariyan were kirin.

Bêrîvan Omer cîgira hevserokatiya rêveberiya herêmî a herêma Cizîrê wiha dawî li axaftina xwe anî: “Hewildana me ji bo pirojeyên sala 2024`an ku bi awayekê rêk û pêk em karibin pêk bînin. Her wiha pirsgirêkên gel yên girêdayê şaredariyê çareser bikin. Em bi hêvîne ku di vê derbarê de gel jî bi me re bibe alîkar. Ji ber ku ev welat ê me hemiyane û pêwîste ku her kes xwe perbisiyar bibîne û herêmê bi parêze.”

# Jin û zarok hîn di bin bandora hişmendiya DAIŞ`ê de dijîn

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

**Rêvebera Kampa Roj Hukmiya Ibrahîm diyar kir ku ji bo zexta li ser Kampa Holê bê kêmkirin, me hin jinên DAIŞ`î di kampa Roj de bicih kirin. Herwiha guhertineke zêde di hizra jinên DAIŞ`î de pêk nehatiy e.**

Kampa Roj di sala 2015`an de ji bo welatiyên gundewarên bajarê Hesekê û Dêra Zorê yên ku di dema êrişên Cebhet Elnesra li ser gundewar û bajarên wan koçber bibûn, hat avakirin. Destpêka avakirina wê li gundê Hekemiya yê girêdayî bajarê Dêrikê bû, li wî gundî 2 mehan ma, piştre kamp hat veguhestin ji bona gundê Girê Reş, niha jî bi kampa Roj tê naskirin. Herwiha piştî gundewarên Hesekê û bajarê Dêra Zorê bi riya YPG û YPJ`ê hat rêzgarkirin, ev koçber vegeriyan mal û warên xwe. Di heman demê de çeteyên DAIŞ`ê êrişî bajarê Mûsil yê herêma Iraqê kirin û nêzî 500 malbatên ku gundên wan li ber sînor bû, derbasî xaka Rojava bûn û di Kampa Roj de hatin bi cih kirin. Di dawiya sala 2016`an de bajarê Mûsilê û gundewarên girêdayî wê ji çeteyên DAIŞ`ê hate rizgarkirin, lewra hejmareke zêde vegeriyan malên xwe. Êdî di sala 2017`an de, beşek ji jinên DAIŞ`î yên revyayî û li ber sînor ku hatibû girtin li Kampa Roj hatin bi cih



kirin. Herwiha di sala 2019`an de, ji bo zexta li ser Kampa Holê kêm bibe, Kampa Roj hat berfirehkirin. Li gorî wê yekê û piştî ku kampe hate berfirehkirin û amedekirin derdorî 300 û 96 malbatî têde hate bi cih kirin û di dawiya sala 2022`an de peşê 3 yan di hindirê Kampa Roj de hat avakirin û têde nêzî 144 malbatî hate bi cih kirin. Di derbarê kar û xebata Kampa Roj de Rêvebera Kampa Roj Hukmiya Ibrahîm ji rojname me re axivî.

Hukmiya Ibrahîm diyar kir ku di Kampa Roj de koçberên Sûrî, Iraqî, Jin û zarokên DAIŞ`î hene û wiha got: “Di Kampa Roj de koçberên Sûrî, Iraqî, Jin û zarokên DAIŞ`î yên biyanî, Iraqî û Sûrî jî hene. Herwiha di kampê de hejmara koçberên Sûrî 14 malbat û 67 kesên, koçberên Iraqî 69 malbat 316 kesin, hejmara biyaniyên DAIŞ`î 734 malbat 2 hezar û 213 kesin. Di kampê de 3 rêxistinên bingehîn kar û xebatê didin meşandin, ew rêxistin jî evin; Rêxistina Bilomond, Xelasî û ERS, ji derveyî wê komeleya Yunisêf e, ew jî bi riya komeleyan lê kar dike. Di aliyê Bilomond de betanî û selên xwarin û paqijiyê tên belavkirin. Rêxistina ERS jî navendeke wê ya tenduristiyê heye, di aliyê nexweşiyan de kar û xebatê dike û di warê tenduristiyê de bi jinan ve mijûl dibin. Navenda Heyva Sor a Kurd jî cihê xwe di nava kampê heye, ew jî di mile tenduristiyêve kar û xebatê xwe dike. Ev rêxistinên ku pêwistyên kampê, di aliyê kon, betanî, sivinc, pakîtên xwarin û paqijiyê de pêk tînin. Nexweşxaneyeke tenduristiyê jî di hundirê kampê de heye, Heyva Sor a Kurd li ser disekine û li gorî derfetên xwe, tedawiya malbatên di kamê de dike.”

### Jinên DAIŞ`î hêviyên xwe bi dewleta Tirk ve girêdidin

Hukmiya Ibrahîm di berdewamiya axaftina xwe de eşkerekir ku guhertina zêde di hizra jinên DAIŞ`î de nahtiye çêkirin û wiha got: “Em diçin nav kampê û bi jinên DAIŞ`î re rûdinên ji bo tirsa heyî rakin. Ji xwe guhertina zêde di hizira jin û zarokên DAIŞ`î de pêk nehatiye. Ji ber derfeta xwe nabînin ku careke din xwe vegerînin û di navçeyekê derdora wê ji hemû pêkhateyan e, ne weke kampa Holê ye, bi taybet di demên dawiyê de, dema êrişên dewleta Tirk a dagirker li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê zêde bibûn, jinên DAIŞ`î rabûn û bi gotinên xwe yên ‘Alah û Akber’ û em ê vegerin bang dikirin, ev yek jî da diyarkirin ku vegera xwe bi riya dewleta Tirk a dagirker re dibînin.”

### Zarokên di kampê de li ser Hişmendiya DAIŞ`ê têne mezin kirin

Hukmiya Ibrahîm di berdewamiya axaftina xwe de diyar kir ku belavkirina konan li gorî hejmara kesên di malbatê de tên belavkirin û wiha got:”Rêxistinên li ser belavkirina konan disekinin, li gorî wan malbatek zêdeyî 8 kesan be, di 2 konan de tên bicih kirin. Herwiha 2 dibistan di kampê de hene, zarokên bi temen 3 heya 6 salî diçin rewda, piştre ji refa 1 heyanî 7 diçin dibistanê, ew jî di bin Rêxistina Xelas de ye. Di aliyê dibistanê de astengiyên ku derdikevin pêşiya me dema ku tomarkirina nava tê kirin, hejmara navên zarokan gelekin û li gorî wan çente, pênûs û lênûs tên belavkirin. Piştî dibistan tê dest pê kirin, em wê hejmarê di dibistanê de nabînin, sedema wê jî di hundirê kampê de jinên DAIŞ`î cihên perwerdeyê ji xwe re dane avakirin û lênûs û pênûsan ji bona xwe dibin û bi riya wê zarokan fêrî hizirên DAIŞ`ê dikin. Ji ber vê yekê me pênûs û lênûs di bazara kampê de qedexe kirin.”

### Zarokên DAIŞ`ê wê di siberojê de bibin xeterî ji bona civakê

Rêvebera Kampa Roj Hukmiya Ibrahîm axaftina xwe wiha qedand: “Astengiya ku di kampê de em rastî wê tên, zarokên DAIŞ’ê, bi taybet zarokên ku temenê wan dibin zêdeyî 12 salan, ji ber di vî temenî de ji aliyên dayikên xwe tên xapandin. Jinên DAIŞ`ê zarokên xwe di hundirê kampê de, bi şev ji bona parastinê erkdar dikin, ji bo ku dema tiştek bibe, agahiyê bidin wan. Di pêşerojê de zarokên DAIŞ`ê wê bibin bela serê civakê. Ji ber vê yekê me gelek caran ji bo vê yekê jî me bi rêxistinan re nîqaş kir û me got; navendên amadekirinê ji derveyî kampê ji zarokan re bidin avakirin, da ku dûrî bandora hişmendiya DAIŞ’ê bin û li ser bingehê perwerdeyeke rast bên fêrkirin. Jinên  ku şandeya welatê wan tên û daxwaza wan dikin bi riya balyozxaneya wan dewletan re têne radestkirin. Palyozxaneya wê dewletê têkiliyan bi Desteya peywendiyên derve re dike û bi desteya peywendiyên derve ve tensîq tê çêkirin û bi wî rengî jinên heyî ji bona welatên wan têne radestkirin.”



# Bîlançoya êrişên dawî yên dewleta Tirk a dagirker

Bi armnaca qirkirina gelên herêmê û têkbirina vîna azadiyê, dewleta Tirk a qirker û faşîst êrişên xwe yên li dijî gelên bakur û rojhilatê Sûriyê didomîne. Di şeva 12 Çileya 2024’an de, dagirkeriyê careke din êrişî binesaziya herêma bakur û rojhilatê Sûriyê kir, di encamê de stasyonên petrol, gaz, av û cihên xizmetguzariyê hatin hedefgirtin.

**Navenda nûçeyan/Qamişlo**

Dewleta Tirk a dagirker di şeva 12Çileya 2024’an de careke din dest bi êrişeke hovane li ser herêma bakur û rojhilatê Sûriyê kir, tevahiya binesaziya herêmê kir armanca êrişên xwe. Ji Dêrikê bigre hetanî Şehbayê tevahiya cihên xizmetguzariyê bûn armanca êrişên dagirkeriyê.

**Cihên hatine bombebarankirin wiha ne:**

- Gundên Xirbet Şeala û Hirbil ên kantona Efrîn û Şehbayê hatin topbarankirin. Bi 2 roketan nuqteya hêzên hikumeta Şamê ya li bendava Şehbayê hat bombebarankirin.
- Nuqteya hêzên hikumeta Şamê ya li gundê Xerbîsan ê Kobanê bi balafira bê mirov a bi çek hate hedefgirtin.
- Gundê Şewarxa yê navçeya Şera ya Efrînê hat topbarankirin.
- Stasyona petrolê ya li başûrê rojavayê navçeya Tirbesipiyê ya di navbera gundên Gir Dahol û Gir Şêran de hatin bombebarankirin.
- Bankeya çandiniyê ya li başûrê Tirbespiyê, devera navbera gundên Gir Kendal û gundê Şirk ên herêma Koçerat a Dêrikê de hat bombebarankirin.
- Navenda navçeya Eyn Îsayê.
- Stasyona kehrebeyê ya Eyn Îsayê.
- Benda kontrolê ya li deriyê başûrê yê ketina Eyn Îsayê.
- Gundê Xalidiyê yê rojavayê navenda navçeya Eyn Îsayê.
- Bajarokê Celebiyê yê 45 kîlometre dikeve başûrê bajarê Kobanê.
- Navenda Temwînê (Çavdêriya bazarê) ya li Dirbêsiyê.
- Cihê berê yê şirketa Lavarge ya fransî ya li rojhilatê Kobanê 3 caran hat bombebarankirin.
- Di êrişa bi balafira bê mirov a bi çek a li ser gundê Kerbetlî yê navçeya Dirbêsiyê  de jina bi navê Ehlam Ebdurezaq Remo û zarokên wê Rojan (3) û Can (4) birîndar bûn.
- Stsayona ceyranê ya bajarê Kobanê.
- Gundê Berkevirê yê Dirbêsiyê.
- Çewilka pez a li gundê Şêx Copan ê başûrê bajarê Kobanê hat bombebarankirin.
- Li devera navbera gundên Quneytra û Şaemsûr ê rojavayê Dirbêsiyê 3 cih hatin bombebarankirin.
- Nuqteya hêzên Şamê ya li gundê Şewarxe yê navçeya Şerayê 3 caran hat topbarankirin.
- Tîmên agirkujiyê yên hewl didan şewata ji ber bombebaranê ya li şîrketa Lavarge ya li Kobanê vemirînin, ji aliyê balafirên dewleta Tirk ve hatin hedefgirtin.
- Li navneda bajarê Kobanê embareke genim hat bombebarankirin.
- Li rojavayê bajarê Kobanê daristanek hat bombebarankirin.
- Di êrişa hewayî ya li dijî noqteya hêzên Şamê ya li gundê Dibane yê Qamişloyê de 5 leşkerên Şamê jiyana xwe ji dest dan.
- Stasyona kehrebeyê ya li navçeya Amûdê û gundê Kotihê yê rojavayê navçeyê hatin bombebarankirin.
- Rojnamevanan dîmenên cihê êrişa li Kobanê dikişandin jî hatin hedefkirin.
- Aşxaneya Dirbas a li Amûdê hat bombebarankirin û 2 karkerên bi navê Mihemed Xêr Şêxî (23) û Hisên Ayiş Hisên (45) birîndar bûn.
- Gundê Merkeba yê Amûdê hat hedefkirin.
- Şirketa Nêrgiz a li gundê Heremê Şêxo yê rojavayê bajarê Qamişloyê hat hedefkirin.
- Stasyona kerebeyê ya li Qamişlo hat bombebarankirin.
- Depoyek li ser rêya balafirgeha Qamişloyê hat bombebarankirin. Di êrişê de zarokek bi navê Hêlîn Mihemed birîndar bû.
- Dibistana fêrkirina ajokariyê ya bajarokê Girbawî yê Qamişlo hat bombebarankirin.
- Kargeha çêkirina helawê û tehînê ya li rojavayê Qamişlo hat bombebarankirin.
- Stasyoneke petrolê ya li başûrê rojavayê Tirbespiyê hat bombebarankirin.
- Benda Hêzên Ewlekariya Hundirîn a li gundê Xeznê ya Tirbespiyê hat bombebarankirin.
- Cihê petrolê ya li gundê Xatûne yê Tirbespiyê hat bombebarankirin.
- Stasyona petrolê ya Ude ya li rojhilatê Tirbespiyê hat bombebarankirin.
- Stasyona gazê ya sereke ya li Tirbespiyê 10 caran hat bombebarankirin.
- Benda kontrolê ya hêzên ewlekariyê ya li gundê Kevirê Spî yê başûrê rojavayê Qamişlo hat bombebarankirin.
- Stasyona kehrebeyê ya li Tirbespiyê hat bombebarankirin.
- Navenda petrolê ya li rojhilatê Tirbespiyê 3 caran hat bombebarankirin.
- Navenda petrolê ya li gundê Girê Pirê yê Tirbespiyê hat bombebarankirin.
- Navenda Siwêdiyê ya ku kehrebeyê dide kantona Cizîrê hat bombebarankirin.
- Navenda Tifle ya safîkirina sotemeniyê ya li herêma Koçerat a Dêrikê hat bombebarankirin.
- Stasyona xazê ya li gundê Siwêdiyê ya li navbera Girkê Legê û Dêrikê 10 caran hat bombebarankirin.
- Gundên Eyn Deqnê, Minx û derdora navçeya Til Rifatê yên girêdayî Şehbayê hatin topbarankirin.

**Êrîşên 15’ê Çileyê:**

- Li navçeya Til Temir depoyên genim ên Um Kêf ên rojavayê navçeyê bi çekên giran hatin topbarankirin.
- Embarên genim ên li Um El-Kif ên li rojavayê Til Temirê ji aliyê artêşa



Tirk a dagirker û çeteyên wê ve hatin topbarankirin.
- Li bajarê Qamişlo sitatoya elektirîkê hat hedef kirin.
-Li Dirbêsiyê statoya elektirîkê hat hedef kirin, di encama de karkerek bi temen 33 salî di hundirê stasyona belavkirina elektirîkê birîndar bû.
-Li dirbêsiyê hola Dilovan a dawatan jî hat tobarankirin.
-Bajarokê Rimêlan ê girêdayî bajarê Qamişlo ya kantona Cizîrê ji hêla balafirên bêmirov ên dewleta Tirk a dagirker ve tên bombebarankirin. Herwiha destpêkê, depoyên çaksazkirina bîrên petrolê û stasyona kehrebê ya li bajarok hatin bombebarankirin.
-Li naverasta Qamişloyê li nêzî Çerxerêya Sonî û sûka navendî malek bombebaran kir.
-Dewleta Tirk avahiyeke li taxa Sîna ya li rojhilatê Qamişlo ya kantona Cizîrê topbaran kir.
-Dewleta Tirk a dagirker stasyona Udê ya petrolê û stasyona kehrebê ya navçeya Tirbespiyê ya kantona Cizîrê ya Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bombebaran kirin.
-Balafirên dewleta Tirk a dagirker bîrên gazê li başûrê navçeya Tirbespiyê ya kantona Cizîrê bombebaran kirin.
-Dewleta Tirk a dagirker benda Hêzên Ewlekariya Hundirîn a li nêzî gundê Şirk ê girêdayî herêma Koçerat a Dêrikê ya kantona Cizîrê bombebaran kir.
-Gundê Girbelet ê li herêma Koçeratê ya girêdayî bajarê Dêrikê ji aliyê balafirek bêfirokevan û biçek a dewleta Tirk a dagirker ve hat bombebarankirin.
-Dewleta Tirk a dagirker Li taxa Alaya ya bajarê Qamişlo ya girêdaye Kantona Cizîrê avahiyek bombebaran kir.
-Dewleta Tirk a  dagirker navenda Hêzên Ewlekariya Hundirîn a li rojhilatê bajarê Qamişlo ya girêdaye Kantona Cizîrê 3 caran bombebaran kir.
-Dewlet Tirk a dagirker û çeteyên wê bi çekên giran gundên Til El Werd û El Rebîat ên başûrê Zirganê û gundê Mihermele, Dada Ebdal, Bobî, Til Hirmil û Esediyê yên rojava û bakurê rojavayê Zirganê topbaran kir.
- Dewleta Tirk a dagirker li naverasta Qamişloyê li nêzî Çerxerêya Sonî û sûka navendî malek bombebaran kir.
-Dewleta Tirk a dagirker stasyona Udê ya petrolê û stasyona kehrebê ya navçeya Tirbespiyê bombebaran kirin.
-Dewleta Tirk a dagirker Stasyona petrolê ya li başûrê rojavayê navçeya Tirbesipiyê ya di navbera gundên Gir Dahol û Gir Şêran de carek din bombebaran kir.
-Dewlet Tirk a dagirker gundên Şexler a Jorîn, Zormixar û mezereya Ehmed Munîr ên dikevin rojavayê Kobanê bi çekên giran topbaran kir.
-Dewleta Tirk a dagirker kargeha gazê ya li gundê Girzîro yê Dêrikê yê kantona Cizîrê bombebaran kir.
-Herî dawî girtîgeha li başûrê bajarê Hesekê rastî êrişan hat. Di encamê de zirarên madî li avahiya girtîgehê bûn.

# ‘Wê nikarbin vîna gelên azadîxwaz bişkînin’

**Navenda nûçeyan/Qamişlo**

**Welatiyên bajarê Qamişlo diyar kirin ku hêrsa wan li hemberî êrişên dagirkeriyê roj bi roj gurtir dibe û gotin; Bi zêdebûna êrişan em ê berxwedan û têkoşîna xwe zêdetir bikin.**

Bi dirêjahiya şoreşa Rojava re, êrişên dewleta Tirk a dagirker nahtiye rewastandin, dagirkerî her car bi rêbazekî cûda û dijwartir êrişî Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê dike. Herî dawiyê jî di şeva 12 Çileya 2024`an de dewleta Tirk a faşîst careke din êrişî Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir. Dewleta Tirk a dagirker roj bi roj bi rengekî dijwartir û birêbazên cur be cur êrîşî Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê dike. Êrîşên dewleta Tirk a dagirker tu sînoran nasnake, binesaziya herêmê û hemû cavkaniyên jiyanî dike hedefgirtin. Armanca sereke ji êrîşên dewleta Tirk a dagirker tunekirina aboriya herêmê û koçberkirina gelên wê ye, li hemberî wê jî berxwedana gelan û girêdana wan bi axê zêde dibe.

Di derbarê êrişên dewleta Tirk a dagirker de welatiyên bajarê Qamişlo ji rojnameya me re axivîn.

Welatiya bi navê Cîhan Ehmed diyar kir ku dewleta Tirk a dagirker ji hêza Rêveberiya me hêris dibe û wiha got: “Heger dewleta Tirk a dagirker ji Rêveberiya me hêris nebaya êrişên xwe li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêk netanî. Herwiha her dem li hemberî êrişên dewleta Tirk a faşîst wê berxwedana me biserkev e. Bela dewleta Tirk baş bizanibe ku em ê ji zarokê 7 rokî heta 70 salî têkoşîn ji bo axa xwe bikin û dev ji axa xwe bernadin, di heman demê de doza azadiya Rêber Apo ya fîzîkî pêk bînin. Bêdengiya dewletên navnetewî li hemberî sûcên ku dewleta Tirk a dagirker li ser herêma me dide meşandin, da diyarkirin ku wan kilopa kesk jêre nîşan daye û hevkarên sûcên



Cîhan Ehmed

dewleta Tirk in, lê hêz û vîna me jî ji ya dewleta faşîst xurtir e.”

### ‘Bi zêdebûna êrişan em ê berxwedanê zêde bikin’

Di heman çarcoveyê de welatiya bi navê Behiya Hesen destnîşan kir ku bertekên gelan li hemberî dagirkeriyê gurtire û wiha got: “Dewleta Tirk a dagirker li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bineszaî, cihên xizmetguzarî û tevahî çavkaniyên jiyanî dike hedefa êrişên xwe, çi bi tank û tobpan be çi bi balafirên bêmirov li ser me pêk



Behiya Hesen

tîne. Lê em gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê ti çarî ji êrişên dewleta Tirk a dagirker hêris nabin. Bi zêdebûna êrişan em ê berxwedan û têkoşîna xwe zêde bikin.”

### ‘Dema mijar dibe gelê kurd cîhan xwe keer û lal dike’

Di heman mijarê de welatiyê bi navê Emîn Mihemed êrişên dewleta Tirk a dagirker şermezar kir û wiha got: “Qaşo Dewletên Navnetewî mîna Rûsiya û Amerîka li vir dimînin, lê bi êrişên dewleta Tirk re dengê



Emîn Mihemed

xwe nakin û dema mijar jî dibe gelê kurd xwe ker û lal dikin. Dewleta Tirk dewletekî terror e û li hemberî êrişên wî dibêjin heta nefesa dawî em ê li ser piya bin û dijî sûcên Erdogan bisekinin. Şoreşa Rojava şoreşekî miroviyê ji bo miletê bindeste, ji bo ku gelên bi salan di taritiyê de jiyan kirine bixe roniyê, lê dewleta Tirk ji vê yekê hêris dibe naxweze gelê kurd û gelên bindest di nava ronahiyekê de jiyan bikin, lewma rojane êrişên xwe li ser me dewam dike.”

# Bi hevgirtin û vîna gelan wê êriş têk biçin

**Li dijî êrişên dewleta Tirk a dagirker ên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriye. Gelê herêmê bi hemû pêkhateyên xwe her tim li ser piyaye û wê ji bona parastina ax û destkeftiyên xwe her li ser piy be û wê tucarî serî li hemberî êriş û gefên dagirkeriyê serî netewîne.**

**Navenda nûçeyan/Qamişlo**

Dewleta Tirk a dagirker bê navber êrişî binesaziya herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dike. Di 4'ê Cotmehê de û di 23'ê Berfenbara 2023`an de jî careke din êrişkir û ev êriş heyanî îro jî berdewamin. Cihên ku di êrişan de hatine armanckirin cihên petrol, elektirîk, fabrîkayên nîsk, pembû, zeytûn, çapxane, nexweşxane, rêbend û gelek cihên xizmetguzariyê bombebaran dike. Li hemberî van êrişan jî gel her tim di nava berxwedaniyê deye.

Girêdayî armanca êrişan û li hemberî van êrişan berxwedana gel, hevseroka Tevgera Civaka Demokratîk a (Tev-Dem) Roken Ehmed û Endamê Kordînasiyona Tevgera Civaka Demokratîk a (Tev-Dem) Yûsif Kûtê ji rojnameya me re axivî.

Roken Ehmed diyar kir ku armanca dewleta Tirk a dagirker qirkirina gelê kurd e, lê li hemberî van êrişên hovane berxwedana gel wê her berdewambe û got: "Di êrişan de binesaziya herêmê hat armancgirtin. Armanca êrişan koçberkirin û qirkirina gel e. Dewleta Tirk a dagirker sekin û îradeya gelê berxwedêr tehemul nekir, lewma êrişên xwe li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dewam dike û binesaziyê wê armanc dike.

**'Armanca êrişan şikandina vîna gel e'**

Roken Ehmed wiha berdewamî da axaftina xwe û got: "Îro kargehên ku gel têde kar dike û debara jiyana xwe dike mîna kargehên nîsk, zeytûn, aş û depoyên genim kirin armanc? Civakeke ku nikaribe xwedî li xwe derkeve, ji komkujiyê re vekiriye, faşîzma dewleta Tirk ku bi pêşengtiya Erdogan tê birêvebirin, ji bo ku rehê civakê zuha bike, bê îrade bihêle, bê siberoj bihêle, koçber bike, êrîş dike. Di dîrokê de gotinek heye dibêje ku 'Koçberî birayê mirinê ye' dema civakek koçber bû, ji axa xwe dûr ket, dibe birayê mirinê. Mirov dikare li ser axa xwe xwebûna xwe biparêz e.

**'Armanca dewleta tirk qirkirina gelê Kurd û qelskirina şoreşa Rojava ye'**

Hevseroka Tevgera Civaka Demokratîk (Tev-Dem) Roken Ehmed di dawiya axaftina xwe de berxwedana gel li hemberî êrişan wiha anî ziman: "Sekna gelê me li hemberî êrişên dewleta Tirk a dagirker her berdewame û li dijî êrişan xwedî sekneke biromete. Dewleta Tirk dixwaze gel û hebûna wî qirbike, ji bona wê pêwîste ku gelê me ji vê xurtir û bi hêztir be. Çalakiyên gel cihê pîrozî ye û emê heyanî serkeftinê li pey şervanên xwe bin. Dijmin pêngaveke topyekun a êrişan daye destpêkirin, li hemberî van êrişan jî gel xwedî sekne û wê heyanî serkeftinê her di nava berxwedan û tekoşînê de




Rûken Ehmed

be. Hedefa dewleta Tirk qirkirina gelê Kurd û qelskirina şoreşa Rojava ye, lewma pêwîste ku gel bi her awayî li ber xwe bide û dawiya dagirkeriyê bîne.

**'Wê gel tucaran li hemberî gef û êrişan serî netewîne'**

Di heman çarçoveyê de Endamê Kordînasiyona Tevgera Civaka Demokratîk (Tev-Dem) Yûsif Kûtê wiha axivî û got: "Dewleta Tirk a dagirker bi awayekî hovane û li pêş çavê cîhanê û hêzên navteweyî êrişî herêmê dike. Em êrişên dijminane û bêdengiya hêzên navneteweyî ya li hemberî êrişên



Yûsif Kûzî

li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê û yekîtiya xaka Sûriyê şermezar dikin. Pêwîste baş were zanîn ku şerê qirkirinê yê ku dewleta Tirk a dagirker dide meşandin li ser tevahî Sûriyê ye. Dewleta Tirk a faşîst dixwaze tirsê bixe dilê pêkhateyên herêmê û herêmê vala bike. Pêwîste ku gelê me bi hemû pêkhateyên xwe ji bona hemû rewşên heyî xwe amedebike û di çarçoveya şerê gelê şoreşgerî de li cem rêveberiya xwe be û bi hêza xwe bawerbe. Bile cîhan tev bizanibe ku em serî li hemberî gef û êrişan natewînin û emê parastina xwe û axa xwe bikin."

# 'Armanca Partiya Siberojê Sûriyeke demokrat û pirreng e'

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

**Endamê Meclisa Giştî ya Partiya Pêşerojê ya Sûriyê Ebd Elfetah Fatimê anî ser ziman ku Partiya Pêşerojê ji tevahiya gelên Sûriyê re xebateke siyasî ji bo siberoja Sûriyê dide meşandin. Herwiha Fatimê tekez kir ku yek ji xalên girîng yên ku di kongreyên meclisan de tê guftûgokirin bidawîkirina kirîza Sûriyê ye.**

Di nava van hemû geşedanên siyasî û leşkerî yên ku rastî Sûriyê hatin û destpêkirina kirîza Sûriyê ya ku ji bo gelên sûrî bû mîna amûra kujeriyê tevger û bizavên siyasî jî hebûn.

Piştî destpêkirina şoreşa 19'ê Tîrmehê ya li ser bingeha Netewa Demokratîk û paradîgmaya Rêber Apo, êdê hewldan hatin kirin ku projeyek siyasî ya niştimanî ku hemû gelê Sûriyê di nav xwe de bihewîne û nûnertiya hemû pêkhate, mezheb û çandan bike, hat çêkirin.

Herwiha Partiya Pêşerojê ya Sûriyê yek ji partî, tevger û bizavên siyasî ya ku di 27'ê Adara 2018'an de bi kongrekê di bin durşmeya 'Sûryeke demokrat, pirreng û nenavendî' li kantona Reqayê hate damezrandin, bû.

Herwiha di kongra damezrandina partiyê de, yekîtiya xaka Sûriyê û redkirina her hewldaneke ji bo parçekirina wê, yek ji biryarên herî girîng bûn ku li ser hate erêkirin. Kongra danmezrandinê bi hilbijartina Meclîsa Giştî ya partiyê ku ji 81 endaman pêk dihat, bi dawî bû.

Di encama vê kongrê de Îbrahîm Elqeftan ji bo serokatiya partiyê û Hevrîn Xelef jî ji bo sikirtêra Giştî ya Partiya Pêşerojê ya Sûriyê, hatin hilbijartin û niha jî Ebd Hamid Elmehbaş serokê wê ye û Sîham Dawûd jî sikrtêra giştî ye.

Partiya Pêşerojê ya Sûriyê êdî bi armanca pêkanîna Sûreyeke demokrat, pirreng û tê de mafê hemû pêkhateyên Sûriyê parastî be û bi hevbeş bijîn, xebateke siyasî da meşandin.

Vê partiyê di nav kar û xebata siyasî ya ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê, pêşeroja Sûriyê ya aştiyane siyastmedarên wê gelek bedel dan û şehîd ketin. Şehîdên wê jî sikrtêra Giştî ya Partiya Pêşerojê ya Sûriyê Hevrîn Xelef a ku ji aliyê komên çete yên girêdayî dagirkeriya Tirkî ve di êrîşa li ser Serêkaniyê û Girê Sipî de, di sala 2019'an de hat şehîdxistin. Di heman demê de endamê komîteya Amadekar a partiyê Umer Elûş jî di sala 2018'an de di rewşeke nediyar de ji aliyê xwînrêjan ve li Girê Sipî hat şehîdxistin.

Partiya Pêşerojê guhdanê bi çareseriya kirîza Sûriyê, siyaseta Bakur û Rojhilatê Sûriyê û ya derveyî herêma wê, pirrengiya gelan, çand, perwerde, aliyê civakî, leşkerî û ewlehiya pêkhateya kurd, ereb, ermen, çerkes û hwd… dike.

Herwiha Partiya Pêşerojê ya Sûriyê her 2 salan kongreyên xwe li dar dixe. Navendên vê partiyê li her 7 kanton û bajarên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi awayekî fermî hene û li gor wê jî bi destpêka sala 2024'an re partiya Pêşerojê dest bi lidarxistina kogreyên xwe yên meclisên her kanton û bajaran, kir.

Girêdayî damezrandina Partiya Pêşerojê ya Sûriyê û lidarxistina kongreyên wê yên îsal endamê Meclisa Giştî ya Partiya Pêşerojê Ebd Elfetah Fatimê ji rojnameya me re axivî.

**'Partiya Pêşerojê ji bo siberoja pêkhateyên Sûriyê hatiye damezrandin'**

Ebid Elfetah Fatimê anî ser ziman ku Partiya Pêşerojê ya Sûriyê ji bo siberoja pêkhateyên Sûriyê hate damezrandin û wiha domand: "Piştî demeke dirêj ji kirîza Sûriyê, me bi derfetên heyî dikarîbû partiyeke siyasî ku hemû pêkhateyên Sûriyê bihewîne nav xebata siyasî, damezirînin. Armanc ji damezrandina vê partiyê ew bû ku Partiya Pêşerojê bibe hêzeke siyasî û di bin sîwana Rêveberiya Xweser de û li gel partiyên din bikarbe nûnertiya hemû pêkhateyên li erdîngariya Sûriyê dijîn, bike. Me weke Partiya Pêşerojê ya Sûriyê ji wê demê heta roja îro xebateke siyasî li ser asta Sûriyê da meşandin. Herwiha li gor erdîngariya Bakur û Rojhilatê Sûriyê me li hemû kantonên wê navendên xwe bi awayekî fermî vekirin. Li aliyekî din jî li Şamê, Heleb, Siwêda û deverên li beravê Deryaya Spî xebateke siyasî heye û ji ber siyaseta hikumeta Şamê ya desthilatdar bi awayekî veşartî karê siyasî tê kirin. Hemû karê ku Partiya Pêşerojê ya Sûriyê dike, ji bo siberoja hemû pêkhateyên Sûriyê ye. "

**'Armanca kongreyên meclisan yê partiyê bi dawîkirina kirîza Sûriyê ye'**

endamê Meclisa Giştî ya Partiya Pêşerojê Ebd Elfetah Fatimê diyar kir ku armanca kongrên meclisan yên Partiya Pêşerojê ya Sûriyê bi dawîkirina kirîza Sûriyê ye û wiha axivî:"Bi destpêkirina sala nû ya 2024'an re me kongreyên meclisên kantonên partiya xwe li dar xistin.



Me di van kongran de xwest kar û xebata xwe ya siyasî binerxînin û bi diyalogê hin mijarên sereke û rewşa siyasî ya heyî guftûgo bikin. Herwiha pirogramekê ji bo pêşeroja Sûriyê û çareserkirina kirîza Sûriyê bixin pilana xwe. Di dawiya sala 2023'an de Hevpeymana Civakî ji aliyê Rêveberiya Xweser ve hat derxistin.Herwiha vê hevpeymanê hin guhertin di warê rêxistinî, aborî, civakî, siyasî û hwd... bi xwe re anî. Em jî weke hêzeke siysî ku li erdîngariya Bakur û Rojhilatê Sûriyê karê siyasî dide meşandin, li gorî van guhertinan tev digerin. Hevpeymana Civakî biryarên bingehîn ji bo çareserkirina kirîza Sûriyê digre nava xwe. Li ser vê bingehê jî kongirên me tên lidarxistin û xalên girîng yên ku li ser maseya diyaloga kongran in Sûriyeke demokrat û pirreng, herwiha xebatkirina ji bo soberoja gel û çareriya siyasî ji bo pirsgirêkên gelên Sûriyê bi giştî ye.



# 'Em hene û em ê hebin'

**Hevseroka Komîteya Şehîd Berxwedan Samiya Xelîl, Endama Meclisa Malbatên Şehîdan Xêriya Hesen û Rêvebera PYD'ê Menîca Heyder kiryarên dewleta Tirk a dagirker li hemberî jinan şermezar kirin û gotin; Emê rê nedin tu kesî ku destdirêjiyê li ser jinê bike û em hene û em ê hebin.**

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Ji destpêka dagirkirina herêma Efrînê ku di 18'ê Adara 2018'an ve û heta niha dewleta Tirk a dagirker û komên çete ên girêdayî wê kiryarên li dijî şêniyên resen û xwezaya herêmê bênavber didomînin. Sûcên dagirkeriya Tirkiye û çeteyên girêdayî wê yên ku li ser gelên Kurd didin meşandin, sûcên dijmirovî ne û tavahî pîvanên exlaqî derbas dikin, tu destdirêjî li ser sererd û binerda herêmê nema û nehatiye kirin. Ji talankirina xwezayê bigire heyanî kûştin û revandina jin û zarokan. Bi tayebet kiryarên dagirkeriyê li ser jinên Kurd bi hovane tên meşandin, li hemberî van kiryaran jî Dewletên Navnetewî û rêxistinên mafê jinê bêdengin û bi vê bêdengiyê jî desdirêjî li dijî jinan zêde dibin.

Di derbarê kiryarên dewleta Tirk a dagirker û çeteyên girêdayî wê yên li ser jinên Efrînê Hevseroka Komîna Şehîd Berxwedan a taxa Xerbî Samiya Xelîl û Endama Meclisa Malbatê Şehîdan Xêriya Hesen û di heman çarçoveyê de Rêvebera PYD'ê ya bajarê Qamişlo Menîca Heyder ji rojnameya me re axivîn.

Hevseroka Komîna Şehîd Berxwedan a taxa Xerbî Samiya Xelîl kiryarên dewleta faşîst û çeteyên girêdayî wê yên li ser jinên Efrînê didin meşandin şermezar kir û wiha got: "Biryarên dewleta faşîst a dagirker ku bi hovane sûcên dijmirovî di derheqê jinên Efrînê dide meşandin ez şermezar dikim. Dewleta faşîst dewletekî qelse, îrada wê qelse, dema ku li hemberî jinên Efrînê cezayên heta dawî bide meşandin em vê yekê qebol nakin. Banga me ji dewletên Navnetewî û



Xêriya Hesen

Mafê Mirovan heye, qaşo dibêjin em Rêxistinên Mafê Mirovane. Lê em dibînin çavên wan ji kiryarên dewleta Tirk a dagirker girtine û xwe bêdeng û lal kirine, ev jî dihêle dewleta Tirk gef û gavên xwe li ser jinan zêde bike. Pêwîste sûcên di derheqê jinan de bê rawistandin dagirkerî nebese li ser wan tê meşandin, êdî rêbazên hovane jî didin meşandin. Em jinên azad ji bo tevgera azadiyê têdikoşin û tu sûcî li ser çi jinê napejirînin."

**'Heta Rêber Apo fîzîkî azad nebe, jin jî azad nabe'**

Di heman mijarê de endama Meclisa Malbatên Şehîdan Xêriya Hesen diyar kir ku dewleta Tirk dewleteke hovane ye û wiha got: "Ji ber ku îrada dewleta Tirk hatiye şikandin, êdî berê xwe dide jinê û li herêmên dagirkirî kiryarên dij mirovî dide meşandin. Dewleta Tirk him êrişan li ser jinan pêk tîne, him jî wan qeydî zindana dike. Jin ji ber fedekare û li ber xwe dide û îro di Rojavayê Kurdistanê de xwe isbat kiriye, lewra dewleta Tirk ji îrada jinê hêris dibe. Jin ji felsefa Rêber Apo fêr bûne û Rêber Apo riya ku nîşanî jinê kiriye riya azadiyê ye. Herwiha heta Rêber Apo fîzîkî azad nebe, jin jî azad nabe. Niha jin li gorî felsefeya Rêber Apo têdikoşe, ji bo wê



Menîca Heyder

dewleta hov a Tirk dixwaze îrada jinê bişkîne, lê îrada jinê nayê şikenandin jin wê heya serketin û azadiyê li ber xwe bide. Jin di zindan, şer û li ku be wê li ber xwe bide. Ji xwe jinên kurd di herêmên dagirkirî de rojane rastî êrîş û kuştinê tên, kesekî dengê xwe nekiriye û negotine çima ev jin tên çewsandin, ji ber ku jina li ber xwe dide tê hedefgirtin. Ev dewletên cîhanê li ser tevahî dewletên cîhanê sûcên dijmirovî qebol nakin, lê dema mijar dibe gelê kurd xwe bêdeng dikin. Hêviya me jî ewe ku mafê jinê bê sitandin. Mafê her mirovekî heye, lê çima yê jinê tuneye. Ji bo wê heta dawiyê em ê berxwedanê ji bo her jineke li ser rûyê erdê jiyan dike bidin meşandin."

**'Em ê dawiya dagirkeriyê û qirkirinê bînin'**

Di heman çarçoveyê de Rêvebera PYD'ê ya bajarê Qamişlo Menîca Heyder destnîşan kir ku ew li dijî siyaseta dewleta Trik û hevalbendên wê ne û wiha got: "Dewlet Tirk a dagirker bi salane destdirêjî, êriş û tûndiyên pir mezin li ser gelê Efrînê dide meşandin û bi taybet jî li ser jinan. Dewleta Tirk tevgera jin, pêşengên civakê û çi kesê ku di axa Rojava de jiyan dike hedef digire. Ji bo tevahî cîhanê



Samiya Xelîl

şerme ku sûcekî pir mezin li ser jinan ji aliyê dewleta faşîst ve tê kirin, lê li hmberî vê yekê jî hemû saziyên mafê mirovan bêdengin. Bûyera herî dawî ku di herêma Efrînê çêbû çawa hejmarek jinên Efrînê hatin binçavkirin û di kesayeta wan de jî xwestin tevahî tevgera jin tune bikin û bê îrade bikin. Lê em wek tevgera jin bi taybet li Rojava û di hundirê şoreşê de ku bi pêşengtiya jinan hatiye lidarxistin, em wê sozê didin ku heta dawiyê, asta têkoşîna xwe bilind bikin û di hemû şert û mercan de xwedî li hebûn û vîna xwe derbikevin."

**'Em ê jiyaneke azad bijîn û ji bona wê têbikoşin'**

Menîca Heyder axaftina xwe wiha qedand: "Heger dijminê me metirsiyeke pir mezin li ser xwe nedîtiba, wê îro êrişî jinan nekiriba. Lê nikare bighêje armancên xwe, ji ber ku jinên têkoşer fikir, hebûn û azadiya xwe ji fikir û felsefa Rêber Apo girtin e. Heta dawiyê em soz didin Rêber Apo, Gerîlayên Azad û Şehîdên azadiyê têkoşîna xwe berdewam bikin û rê nedin tu kesî ku destdirêjiyê li ser jinê bike, em hene û em ê hebin, em ê jiyaneke azad û birûmet bijîn û jiyaneke bêwate nejîn.

## Dê Kurd "Terorîstanê" ava bikin!



**Zekî Bedran**

Dewleta Tirk amedeye ku ji bo perçiqandin û ji holê rakirina Kurdan tevahî cîhanê bişewitîne. Tevahî çavkaniyên Tirkiyê di şerê li dijî Kurdan de xerç dike. Hebûn û destkeftiyên Kurdan ji bo xwe weke dewlemendî nabîne, weke xeteriyekî dibîne. Ji bo ev xeterî ji holê bê rakirin jî bi awayekî xwezayî divê Kurdan ji holê rake. Xwedî hişmendiyek wiha nexweş û dijberî rastiya civakî ne. Ev polîtîka û stratejiya li ser bingehê qirkirinê sed sale didomîne.

Erdogan û rêveberên wî ji bo du sed hezar Tirkên li Qibrisê dewletek cuda ava dikin. Giravek biçûk weke du dewlet parçe kirin. NY û YE ev 50 sale dagirkeriya Tirk a li Qibrisê bi dawî nekir. Tirkiye li gorî biryarên tên girtin tev nagere. Qibris heman demê de dewletek endamê YE ye. Lê heman Tirkiye, perwerdeya bi zimanê dayîkê jî ji 20 milyon Kurdên ku hemwelatiyê wî ne re maf nabîne. Dema parlementerên Kurd di parlementoya Tirkiyê de çend gotinan bi Kurdî dibêjin, pir aciz dibin û weke zimanekî nayê zanîn tomar dikin.

Îmha û înkara Kurdan sed sal li pey xwe dihêle. Lê naveroka wê neguherî. Rê û rêbazên îmhayê hatin pêşxistin û nûjenkirin. Niha çar parçeyên Kurdistanê xistin nava van êrişan. Dewleta Tirk li ku derê Kurdek azad û maf dixwaze hebe wî dixe nava refa dijminan û hewl dide îmha bike. Artêşa xwe ya duyemîn a NATO'yê berdide ser serê Kurdan. Çek, balefir û teknîka demê ya pêşketî bi awayek bê sînor bikar tîne. Dema ev têrê nakin jî bombeyên nûkler ên teqtîkê, çekên bi kîmyewî yên NATO'yê bi awayek rêkûpêk bikar tîne.

Dewleta Tirk li Başûrê Kurdistanê qada hewayî weke dixwaze bikar tîne. Havîn, zivistan, şev û roj hertim bombe dike.

DYE yê pêşiya wan vekiriye, PDK'ê di êrişên dagirkeriyê de li kêleka artêşa Tirk e, hikumeta Iraqê jî xwe bêdeng kiriye. Tirkiyê li Iraqê mafê êrişkirina Başûr, dagirkirin û avakirina baregehan bidest xistiye. Ne saziyên navnetewî ne jî hêzên herêmî nabêjin ka çi karê wî li wir e. Niha herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî xistine nava vê. Kurdan di şerê li dijî DAIŞ'ê de pêşengî kirin. Ji 11 hezar zêdetir şehîd dan. Ji 15 hezar kesî zêdetir birîndar bûn. Hîn jî DYE û koalîsyon li herêmê ye, têkoşîna li hemberî DAIŞ'ê didome û bi hezaran girtî hene. Tirkiye ji bo bihêzbûna DAIŞ'ê û dagirkirina herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê, herêmên dagirkirî ji çeteyan re vekirine û bi êrişên xwe karê wan hêsan dike. Ji bo cîhan qala Kurdan û têkoşîna li dijî DAIŞ'ê neke her tişta ji destê wan tê dike.

Dewleta Tirk ji bo dijminahiya sed salî ya li hemberî Kurdan û polîtîkayên xwe yên qirkirinê veşêre, bi israr gotina "têkoşîna li dijî terorê bikar tîne". Têgîna terorê DYE û hêzên rojavayî bikar anîn û derxistin holê, lê tu kes qasî rêveberiya Tirk ev têgîn hembêz nekirin. Hebûn û pirsgirêka sed salî ya gelekî daxistin têgîna terorê. Hinek "pisporên terorê" jî ragihandin û televizyon dagir kirine, dibêjin "Em girêdana PKK û Kurdan nedin çêkirin". Yanî PKK'ê weke hebûnên ji fezayê hatine nîşan didin. Dibêjin dema navê Kurd tê bikaranîn jî, pêwîste di dema şer de jî nav neyê bikaranîn. Ev nîşan dide ku di înkarê de çiqas bispor bûne.

Dema gerîllayên li Başûrê Kurdistanê bicih bûne, li hemberî leşkeran operasyonan dikin û derbe li wan dixin, qiyametê çêdikin. Weke ku leşker çûne wî çiyayî seyranê. Derketine nêçîra mirovan. Rêveberên Tirk xwe dipişpişînin ku çiqas Kurd kuştine. Lê dema diçin nêçîrê û dibin nêçîr har dibin. Fêr bûne ku ji dûr ve bi balefiran mirovan bikujin. Dema teknîkê bikar neyînin aha wiha perîşan dibin. Hêza wan jî tune ye ku rastiyan ji gelê Tirkiyê û cîhanê re bêjin.

Her tim dibêjin me li ser Garê, Qendîl, Zap û hwd êrişên hewayî kirine, me li evqas cihan xist. Li Tirkiyê kesekî vê lêpirsîn nake. Li wir çend hezar baregehên PKK hene. Kes nabêje, ev bi salan e em lê dixin lê qet xilas nabin. Dema li wir encamekî nagirin vê carê jî êrişî Bakur û Rojhilatê Sûriyê dikin. Qadên jiyana gel dikin armanc, gelek jin, zarok û sivîl hatin qetilkirin. Santralên elektirîkê, cihên petrolê, depoyên genim û hwd. di carekî de bûn malê PKK'ê! Dibêjin "em li çavkaniyên PKK'ê dixin" û hewl didin gelê xwe û raya giştî ya cîhanê bixapînin, rastiyan berovajî bikin.

Dema derbe ji gerîlla dixwin dijberiya xwe ya li hemberî DYE yê zêde dikin. Ji bo polîtîkayên wî yên xelet neyên dîtin û nîqaşkirin, wêjeya netewperestî û dijminên ji derve dikin. Dibêjin "PKK'ê nikare van êrişan pêk bîne, DYE piştgiriyê dide, çekan dide, PKK'iyan perwerde dike. Li Sûriyê 60-70 hezar hêzên çekdar ên PKK'ê hene" û lez dane propogandaya xwe. Weke tê zanîn QSD'ê bi koalîsyonê re li dijî DAIŞ'ê şer kir û şer dike. Di carekî de ev hêz bûn hêzên leşkerî yên PKK'ê! Dewleta Tirk li aliyekî bi raya giştî ya hindirîn dilîze, li aliyê din jî dixwaze zextên li DYE yê bike. Dixwazin DYE hîn zêdetir piştgiriyê bide êrişên wan û têkiliyên xwe ji QSD'ê qut bike. Li DYE yê ferz dikin û dibêjin an em an ew.

Piştî civîna ewlehiyê ya dawî ya Erdogan dîsa gotin, "Çi dibe bila bibe em destûr nadin ku li başûrê axa me hebûnek Kurd çêbibe". Bêguman têgîna Kurd bi kar neanîn. Di vê mijarê de têgînên nû afirandin û wêjeya cîhanê pêş xistin. Di daxuyaniyê de tê gotin ku em destûrê nadin "Terorîstanê". Angu bi milyonan Kurd û Sûrî li vê herêmê najîn. Terorîst hene û dê Terorîstanê ava bikin! Eger baldar bin dema Kurd tên kuştin jî navê wan nayê hildan. Wiha gotin heta ku Tirkiye bi xwe veguherî dewletek teror, tundî û amûrek a şer!

## Li Enqerê siyaseta tabûtan



**Farûk Sakik**

Serhildana Koçgiriyê yan jî Şoreşa Koçgiriyê, yekemîn serhildana li hemberî hikûmeta Enqerê ye.

Çima Kurdan serî li serhildaneke wiha dan? Soz û peymanên ji bo Kurdan hatibûn dayîn pêk nedihatin.

Di 15'ê Mijdara 1920'î de, serokên Kurdan daxuyaniyek radestî Mustafa Kemal kirin.

Di daxuyaniyê de xalek balkêş hebû. Digotin; 'Divê artêşa Tirk a ku ji bo deverên Kurdan hatine şandin, divê vekişin'

Hikûmeta li Enqerê ev daxwazên wan qebûl nekir û artêşa xwe şand herêma Koçgirî. Piştî demekê jî Topal Osman û çeteyên wî şand herêmê. Di encama komkujiyên giran de serhildan têk çû.

Ev serhildan bû destpêka komkujiyan, asîmîlasyon, red û înkarê.

Ev yek hetanî serhildana dawî ya PKK'ê dewam kir.

PKK'ê hemû serhildan baş analîz kiribûn. Kêmasiyên ku pêk hatibûn wan dubare nekir. PKK'ê bawerî bi soz û peyamên wan neanî.

PKK'ê bi zimanê ku ew fam dikin bersiv da wan. Di 15'ê Tebaxa 1984'an de bi şêwazekî cuda daxwaza mafê Kurdan kir. Şer da destpêkirin.

Piştî ku PKK'ê hêza xwe da îspatkirin û qebûlkirin, ji dewleta dagirker re got; kerem bikin werin masa aştiyê-lihevkirinê. Ev bang di sala 1993'yan de ji aliyê Rêber Apo ve hatibû kirin.

Ji vê masa aştiyê tirsiyan. Bawerî bi neviyên Topal Osman anîn û di şer de israrkirin. Şer û dijminatiya Kurdan mîsogeriya desthilata xwe dizanibûn.

Lê di dawiya sala 2023'yan û di destpêka sala 2024'an de gerîla operasyonên şoreşgerî dabûn destpêkirin û encamên baş bi dest xistibûn.

Dema ku min ev nivîs dinivîsî HPG'ê hejmara eskerên dagirker ên hatine kuştin 61 kes îlan kir. Herikandina, dîmenên gerîla yên bi kamerayên xwe di germahiya şer de kişandibûn jî di ajansan de dewam dikir.

Tabûtên cenazeyên eskerên dagirker dema ku ji Zapê birêketin û derbasî Enqerê bûn, li vê derê ji bo parvekirina tabûtan nîqaş û gengeşiyan dest pê kirin. Herkesî dixwest wan tabûtan wek amûrek siyaseta xwe bi kar bînin.

Ev car tiştek cuda bû. Berê dema ku tabûtên neviyên Topal Osman diçûn Enqerê, di bikaranîna tabûtan de lihevkirinek hebû. Herkesî dikaribû van tabûtan bi kar bîne. Lê vê carê gerîla ew gêj kiribûn. Tu encamek ku pê serbilind bin an jî behsa yek qehremaniyeke wan hêzên xwe bikin nemabû.

Medya şerê taybet ket dewrê û sedemên têkçûna xwe rewşa hewayê ya Zapê hincet nîşandan. Her wek gerîla di heman rewşa hewayî de şer nekiribû. Me di dîmenan de dît gerîla çawa wê di berfê de êriş dike û dîsa me dît ku neviyên Topal Osman çawa dixwazin ji ber gurzê gerîla birevin.

Hin general û eskerên berê li dijî gerîlayên Kurdan li herêmê wezîfe kirine û wê demê derbên giran xwarine, derketin ekranên televizyonan, Erdogan û çeteyên wî rexne kirin. Gotin; Em gerîla baş nas dikin, bi vî tarzî encam nayê girtin. (di vê navberê de raboriya têkçûna xwe ya li hemberî gerîla jî vedişartin. Sankî wan berê encam girtine.)

Erdogan û generalên kevin ku di medyaya mixalif de derdikevin bi heman zîhniyetê li du paqijkirina têkçûna artêşa xwe ne.

Heger ewqas li eskerên xwe xwedî derdikevin (ne li yên dijîn, li yên mirî xwedî derdikevin) bila ew 3-4 'neviyên' Topal Osman, yên ji merhameta gerîla filitîne û ji tirsa mirinê li çiyayên Kurdistanê xwe veşartine, kom bike û axa Kurdistanê terk bike.

Em dubare bi bîra wan dixin, çawa ku bapîrên me Alîşêr, Dr. Nûrî Dêrsîmî, Alîşan û Haydar Beg berî serhildana Koçgirî ji bapîrê we Kemalîstan re gotibûn: Divê artêşa Tirk a ku şandine deverên Kurdan lê dijîn herêmê terk bikin, Murat Karayilan jî îro dibêje ji herêmê vekişin, an jî hûn ê yek bi yek bimirin.